Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :438 nameronahi@gmail.com 20- Tebax - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Pembo li ber têk çûyînê ye, cotkar bi fikar in





Berhema çandiniyê ya pembo ya kantona Girê Spî bi têkçûnê re rû bi rû ye. Bi nêzîkbûna dema çinînê re cotkar metirsiyên xwe tînin ziman ku lêçûna wan ji hilberînê dernakeve. Her wiha dermanên tirkiyê yên ji bo zeviyan pirsgirêk mezintir kir.

Piraniya welatiyên kantona Girê Spî debara xwe ji çandiniyê werdigirin, bi taybet çandiniya pembo û genim. Zeviyên li derdora çemê Belîx ji bo çandiniyê gelekî guncaw û axa wan dewlemend e.

Çandiniya pembo li vê herêmê gelekî navdar e û di meha nîsanê de tê çandin û piştî nêzî 5 mehan hilberîna pembo jê tê wergirtin. Hilberîna pembo dabeşî du beşan dibe, beşê yekemîn "pemboyê buharê" di destpêka nîsanê de tê çandin û beşê duyemîn jî "pemboyê xêrî" di meha gulanê de tê çandin.

Lêçûna çandiniyê zêde ye û dibe ji ber rewşa hewayê hilberîn têk biçe. Ji ber ku pemboyê xêrî dereng tê çandin rastî gelek nexweşiyan tê, her wiha dibe ku rastî sermaya Payîzê were. Piraniya cotkaran ji ber van sedeman çandina pemboyê biharê dipejirînin.

Berhema îsal a pembo ji ji sedî 70 rastî ziyanê hat ji ber ku kurm zêde li hilberînê daye. Vê yekê hişt ku metirsiya cotkaran bi nêzîkbûna demsala çinînê re zêde bibe ku nikaribin lêçûna xwe ji hilberînê wergirin.

Ji ber rewşa hewayê û cûdabûna di navbera pileyên germahî û sermayê de, her wiha ji ber ku pêlên qeşayê di Zivistanê de pêk nehatin, hişt ku ziyan bi berhema pembo bibe.

Girêdayî mijarê cotkarê bi navê Salih El-Hatim ê ji bajaroka El-Hêşa axivî û wiha got: "Lêçûna donimeke berhema pembo ya îsal nêzî 40 hezar lîreyên Sûriyê çûye. Her wiha dermankirina pembo herî kêm reşandina donimekê bi 6 hezar lîreyên Sûriyê pêk hatiye."

DERMANÊN TIRKIYÊ PIRSGIRÊK MEZINTIR KIR


Li ber çemê Belîx cotkarên bi navê Ebû Ebdo û Ednan El-Ziyab diyar kirin ku ziyana îsal ya hilberîna pembo gelekî mezin e û cotkar nikarin lêçûna ku pê zeviyên xwe yên pembo çandine ji hilberînê wergirin.

Ednan El-Ziyab got ku wan dermanên çandiniyê yên tirkiyê




kirîne, lê ti sûd li berhema pembo nekiriye û hemû derman sextet derketine û vê yekê hişt ku lêçûna çandiniyê zêde bibe û barê cotkaran girantir bibe.

Komîteya Aborî ya navçeya Eyn Îsa ya girêdayî kantona Girê Spî li gorî derfetan alîkariya beşê çandiniyê kir û semad û sotemenî da cotkaran. Komîteyê navendeke lêkolînan vekir da ku cûreyên tovê yên karibin li hemberî kurm û rewşên hewayê li ber xwe bidin, tesbît bike...*ANHA*



Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 438 20- Tebax- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Dagirkeran gelek welatiyên Efrînê revandin



Li Efrinê hovîtî û wehşeta esker û çeteyên dewleta Tirk a dagirker bê navber didome. Artêşa Tirk ya dagirker û çete rojane welatiyên sivîl direvînîn êşkence li wan dikin, dikujin û hinek ji wan jî di berdêla pereyan de berdidin. Hat ragihandin ku dagirkeran gelek sivîl ji gundê Kefer Sefrê yê girêdayî herêma Cindirêsê revandin û nayê zanîn birine kuderê.*R-2*

# MAM ZEKÎ SONDA ME YA TÊKOŞÎNÊ YE

**Cenazeyê Endamê Koordîsnasyona Civaka Êzidî Zekî Şengalî li goristana şehîd Dilgeş û şehîd Berxwedan bi merasîmeke bi heybet hat oxirkirin. Li gelek bajarên Kurdistanê konên şînê hatin danîn û bi daxuyaniyan soza xwedî derketina li têkoşîna Zekî Şengalî hat dayîn.**



Yekîtiya Êzidiyan a Efrînê ji bo Mam Zekî li Kampa Berxwedan a Efrînê konê şînên danî. Bi sedan kes çûn sersaxiyê. Endamê Koordînasyona Civata Êzidiyan ê Efrînê Silêman Cafer diyar kir ku Mam Zekî ji bo azadiya Êzidiyan têkoşîn kir. Her wiha jinên başûrê Kudistanê jî diyar kirin ku ew ê li ser mîrateya ku Zekî Şengalî hiştiye têkoşînê bilind bikin. *R-2*


KCD, TJA, HDP û DBP'ê li Amedê bi daxuyaniyek hevpar êrîşa li dijî Endamê Koordînasyona Civaka Êzidî Zekî Zengalî şermezar kirin. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin, "Rêveberiya xweser a Demokratîk a Kurdên Êzidî tirs xistiye dilê hêzên paşverû. Em vê êrîşê wekî berdewama êrîşên Kerkûk û Efrînê yên li ser bingeha dijminatiya kurdan pêk hatiye, dibînin." *R-5*

## Hezaran kesî azadiya Ocalan xwestin




Li bakurê Sûriyê meş û çalakiyên ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dewam dikin. Bi hezaran welatiyên Efrîn û Şehbayê bi meşeke mezin azadiya rêber Ocalan xwestin. Meşa ku veguherî mîtîngê de axaftin hatin kirin û tecrîda li ser Ocalan hat şermezar kirin. kesên axivîn diyar kirin ku wê têkoşîna wan ji bo azadiya Ocalan dewam bike. *R-5*

## MSD bi rûspiyên herêma Reqayê re rûnişt



Meclisa Sûriya Demokratîk MSD derbarê encamên civînên MSD'ê bi rêjîma Sûriyê re civînên xwe yê bi gel re berdewam dike. Bi vê armancê li dibistana El-Kerame El-Cinûbiye ya girêdayî Reqayê civînek li dar xist. Bi dehan welatî û rûspiyên herêmê beşdarî civînê bûn. Endamê MSD`ê Hesen Mihemed Elî armanc û encamên civînê bi welatiyan re nirxand. *R-2*

## Azadiya Abdullah Ocalan êdî ferz e



Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li zîndana Îmraliyê di bin tecrîdeke girankirî de ye û ti agahî jê nayên girtin. Parêzer Newroz Uysal diyar kir ku tecrîda li Îmraliyê tê meşandin li devereke din a cîhanê tune ye û anî ziman ku azadiya Ocalan êdî ferz e. Parêzer Newroz wiha got, "Ev 8 sal e em nikarin hevdîtinê bikin. Pîvanên navneteweyî tune hatine hesibandin." *R-3*

## Projeya Rêveberiya Xweser fersendeke dîrokî ye



Çalakvanê siyasî û hiqûqnas Esed El-Ebadî diyar kir ku Projeya Rêveberiya Xweser ya li bakurê Sûriyê tecrubeyeke dîrokî ye û da zanîn ev tecrube serkeftî ye. El Ebadî wiha got, "Tecrubeya rêveberiya xweser fersendeke dîrokî ye. Heger rêjîm tecrubeya li herêmên Bakurê Sûriyê negire, tu guhertin wê li Sûriyê pêk neyû û alozî wê dirêj bike. "*R-4*

## Fermandariya Giştî ya Ewlekariya Hundirîn ji bo cejnê hin tedbîr eşkere kir





Bi armanca parastina ewlehiya welatiyên Bakurê Sûriyê, Fermandariya Giştî ya Ewlekariya Hundirîn a Bakurê Sûriyê daxuyaniyeke nivîskî da cejna welatiya pîroz kir. Fermandariyê ji bo ewlekariya welatiyan hin tedbîrên ku girtine eşkere kir û ji welatiyan xwest ku bibin alîkar. *R-6*

## Di asteke bilind de dest li Tirkiyê tê werdan



Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Riza Altûn li ser krîza navbera Tirkiye û Amerîkayê axivî diyar kir ku di asteke ku heta niha nehatiye kirin dest li Tirkiyê tê werdan. Altûn wiha got, "krîz gelekî kûr e lê belê zîhniyeta li Tirkiyê hewl dane fêhm bike û çareser bike. AKP ji sîstemê dixwaze ku ew li derveyî guherîna li Rojhilata Navîn bê hiştin. Lê belê ev yek li projeya modernîteya kapîtalîst a li ser Rojhilata Navîn nayê." *R-4*

## Plana qirêj a MÎT'ê ya li ser PJAK'ê



Çend roj berê nav û wêneyên rayedarên PJAK û KODAR'ê li ser tora medya civakî hatibûn weşandin û hatibû îdîakirin ku rêveberiya Îranê ji bo kuştina wan xelatê dide. Malpera nûçeyan a bi navê Bitawan ku nêzî hêzên Spay Pasdaran a Îranê ye li ser mijarê nûçeyek weşand. Di Nûçeyê de hate ragihandin ku ev plan plana rêxistina îstîxbaratê ya Tirk MÎT'ê ye. *R-4*

## AKP mîna DAIŞ'ê derbê li îslamê dixe



Dîwana Hevserokatiyê ya KONGRA-GEL bi wesîleya cejna qurbanê peyameke weşand û cejn li Kurdistaniyan û alema Îslamê pîroz kir. KONGRA-GEL destnîşan kir ku rejîma AKP'ê û Erdogan mîna DAÎŞ'ê derbeke mezin li ola Îslamê dixe. KONGRA GEL bang li Kurdistaniyan kir ku li dijî vê rejîma faşîst têbikoşin. *R-6*

## Dewreya 5 hezar mamosteyan bi dawî bû *R-6*

## Bila Iraq ji KENY daxwaza pêşîgirtina êrîşên Tirkiyê bike *R-2*

# Cenazeyê Mam Zekî bi merasîmekê hate oxir kirin

**Cenazeyê Endamê Koordînasyona Civaka Êzidî û Konseya Rêveber a KCK'ê Zekî Şengalî, ku ji ber êrîşa dewleta Tirk a 15'ê Tebaxê şehîd bû, li Şehîdgeha Şehîd Dilgeş û Berxwedan bi merasîmekê hate veşartin. Di merasîmê de axaftin hatin kirin û hat diyar kirin ku ew ê li ser rêya Mam Zekî dest ji têkoşînê bernedin.**



Cenazeyê Endamê Koordînasyona Civaka Êzidî û Konseya Rêveber a KCK'ê Zekî Şengalî, ku ji ber êrîşa dewleta Tirk a 15'ê Tebaxê şehîd bû, li Şehîdgeha Şehîd Dilgeş û Berxwedan bi merasîmekê hate veşartin.

Bi hezaran welatiyên Şengalê li Xanesorê li hev civiyan û darbesta Mam Zekî Şengalî birin herêma Serdeştê ya Çiyayê Şengalê. Şengaliyan darbesta Şengalî li gundê Kolkayê dan ser milan û ber bi Şehîdgeha Şehîd Dilgeş û Şehîd Berxwedan meşiyan.

Hevjîna Şengalî, kur, bira û malbata wî, bi hezaran mirovên ji Mexmûr û bajarên din ên Başûrê Kurdistanê beşdarî merasîmê bûn. Di merasîmê de, posterên Mam Zekî, alên YBŞ û YJŞ'ê hatin hildan. Her wiha dirûşmên 'Şehîd namirin', 'Ey şehîd xwîna te li erdê namîne', 'Zekî namire' hatin qîrîn.

Şervanên YBŞ û YJŞ'ê jî li hizûra Şengalî merasîmeke leşkerî pêk anîn. Di dema merasîmê de ji fermandarên YBŞ'ê Zerdeşt Şengalî axivî û got, "Em sersaxiyê ji gelê Kurd û malbata Mam Zekî re dixwazin. Mam Zekî di encama êrîşekî tirsonekî de şehîd bû. Meha Tebaxê ji bo me meheke komkujiyan e. Ji ber vê di meheke wiha de Mam Zekî kirin armanc. Mam Zekî stûna civaka Êzidî bû. Sembola civaka Êzidî bû. Xwestin di kesayeta Mam Zekî de tevahiya civaka Êzidî tine bikin. Mam Zekî ji bo tifaqa Êzidiyan û xweseriya Şengalê 24 saetan dixebitî. Rola tifaqa di nava partî û rêxistina de dilîst. Heta em negihêjin hedefa Mam Zekî em ê dest ji têkoşînê bernedin. Ji bo parastina civaka Êzidî êm ê li her bihost û kolanan şer bikin. Îro tenê berxwedan para me ye. Ji derveyî berxwedanê tiştekî din pêşiya me nîne."

Piştre jî li ser navê malbata Mam Zekî hevjîna Zekî Şengalî axivî û got: "Bila dewleta Tirk baş zanibe; em ti carî gav di paş de neavêjîn. Em ti carî dest ji ax û doza xwe bernadin. Bi şehîdan nikarin çavê me bitirsînin."

Bi navê Wargeha Şehîd Rustem Cûdî û Saziya Malbatên Şehîdan a Wargeha Şehîd Rustem Cûdî Sûltan Yildiz axivî. Yildiz di serî de sersaxî ji Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, gelê Kurd, gerîla û hevalên wî re xwest û got, wê ji ber êrîşan serî netewînin.

Herî dawî Hevserokê Giştî yê Rêveberiya Şengalê Farid Herbo axivî û got: "Weke gelê Şengalê em ê xwîna Zekî Şehîd li erdê nehêlin. Bila dijmin baş zanibe bi şehadetan wê nekarin me ji hev qut bike. Em ê xewn û hesreta Zekî Şengalî li Şengaleke xweser pêk bînin. Xewna wî tifaqa civaka Êzidî bû."

Merasîm bi qîrîna dirûşma 'Şehîd namirin' qediya.

### RÊ NEHATE DAYÎN KU GELÊ ROJAVA TEVLÎ MERASÎMÊ BIBE

Welatiyên Bakurê Sûriyeyê ku ji bo beşdarbûna merasîma cenazeyê Mam Zekî Şengalî bibin ber bi Şengalê ve bi rê ketibûn, ji ber ku hêzên Iraqê destûr nedan derbasî Şengalê bibin, li ser sînor daxuyanî dan û neçar man vegerin. Wê sibe li herêma Serdeştê ya Çiyayê Şengalê ji bo Endamê Koordînasyona Civaka Êzidî Zekî Şengalî kon were vedan û serdanen sersaxî werin qebûlkirin.

## MSD bi rûspiyên El-Keramê re rûnişt



Meclisa Sûriya Demokratîk têkildarî hevdîtinên bi rêjîma Sûriyeyê re û nirxandina rewşa siyasî bi şêniyên Bakurê Sûriyê re civînan lidardixe û li wan guhdar dike.

Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) bi armanca nirxandina encamên civîna wan bi rêjîma Sûriyê re li dibistana El-Kerame El-Cinûbiye ya herêmê civînek li dar xist. Bi dehan şêniyên herêmê, rûspiyên êlên herêma El-Kerame, gundewarên Reqayê û endamên saziyên sivîl û leşkerî tev li civînê bûn.

Di civînê de Endamê MSD`ê Hesen Mihemed Elî li ser rewşa siyasî ya Sûriyê axivî. Her wiha nirxandin li ser hevdîtinên wan bi rêjîma Sûriyê re kirin û diyar kir ku MSD hewl dide yekitiya xaka Sûriyê, biratiya gelan di navbera hemû pêkhteyan de û hevpeyvînên Sûrî-Sûrî bêyî destwerdanên derve, ava bike.

Hesen Mihemd destnîşan kir ku ew li ser banga rêjîma Sûriyê bi wan re civiyan, wan şandeyek ji hemû pêkhateyên Bakurê Sûriyê ava kir û ber bi Şamê ve çûn.

Hesen Mihemed diyar kir ku ew li ser tecrubeya Rêvberiya Xweser a Demokratîk û pêwîstiya çareserkirina aloziya Sûriyê bê destwerdanên derve axivîn, her wiha derbarê aliyê tendirustiyê û xizmetguzariyê de nîqaş hatin kirin û derbarê derbasbûna hêzên leşkerî yên Sûriyê ji Tebqayê re tu lihevkirin nehatine kirin.

Di dawiyê de Hesen Mihemed Elî li nirxandinên şêniyan û pirsên wan guhdar kir û nîqaş hatinkirin…

*ANHA*

## Dagirkeran gelek welatiyên Efrînê revandin



Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê gelek sivîl ji gundê Kefer Sefrê yê girêdayî herêma Cindirêsê revandin. Ji aliyekî din ve jî dagirkeriya Tirkiyê hinek çeteyên ji Tabûra Mişel Temo girtin.

Li gor nûçeya ajansa ANHA'yê artêşa dagirker a Tirk û çeteyan sivîl ji gundê Kefer Sefrê revandine nayê zanîn bê bi kude birine.

Li gor nûçeya ANHA'yê artêşa Tirk a dagirker hinek çete ji Tabûra Mişel Temo girtin, lê sedema girtina wan nehat zanîn. Ji çeteyên ku hatine girtin navê wan Çîlo Xelîl Ekaş û Ebdo Eyûb hate naskirin.

## Ji bo Mam Zekî konê şînê hate danîn



Yekîtiya Êzidiyan a Efrînê ji bo Mam Zekî yê ku bi sûîkasta dewleta Tirk hatibû şehîdkirin li Kampa Berxwedan a Efrînê şîn danî. Bi sedan kes çûn sersaxiyê.

Piştî rêzgirtinê Endamê Koordînasyona Civata Êzidiyan ê Efrînê Silêman Cafer di şînê de axivî. Cafer got, "Şehîd Zekî Şengalî li her dera Kurdistanê, ji bo azadiya Kurdistanê têkoşiya." Cafer diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker dixwaze gelê Kurd qir bike û dewleta Tirk bi taybetî Êzidiyan dike hedef.

Endam Meclîsa Malbatên Şehîdan Henan Nesro jî got, "Nêz e ku desthilatdar têk biçin. Em ji cîhanê re dibêjin ku bi hezaran kes hene ku dikarin alaya têkoşînê li ba bikin."

Hevserokê Meclîsa Gundê Ehdasê yê navçeya Fafînê Ehmed Silêman jî got, "Dijmin pêşengên gelê Kurd dike hedef û dixwaze nasnameya gelê Kurd tune bike. Li ser bingeha neteweya demokratîk me bi hezaran şehîd dan."

Merasîm bi sloganên ji bo şehîdan bi dawî bû.

## Bila Iraq ji KENY daxwaza pêşîgirtina êrîşên Tirkiyê bike

Komîsyona Bilind ya Mafê Mirovan a li Iraqê êrîşa dewleta Tirk ya li ser Şengalê şermezar kir û daxwaz ji Hikûmeta Iraqê kir da ku bi daxwaznameyekê daxwaz ji Konseya Ewlekarî ya Neteweyên Yekbuyî bike, da ku binpêkirinên dewletên Herêmê yên li ser xaka Iraqê qedexe bike.

Serokê Komîsyona Blind ya Mafê Mirovan a li Iraqê Eqîl Casim li ser êrîşa dewleta Tirk ya li ser Şengalê daxuyaniyek nivîskî belav kir.

Di daxuyaniyê de hat gotin ku ew weke Komîsyona Mafê Mirovan a li Iraqê êrîşên dewleta Tirk yên li ser Bakurê Iraqê şermezar dikin û ew hemû operasyonên li ser xaka Iraq û bê hemahengiya bi Hikûmeta Iraqê re red dikin.

Di daxuyaniya Komîsyona Bilind ya Mafê Mirovan de hat diyarkirin ku dewleta Tirk bi hênceta şerê partiyek çekdar operasyonan li Iraqê dike û di encama van operasyonane de gelek kes dibin qurban.

Herî dawî komîsyonê di daxuyaniya xwe de daxwaz ji Wezareta Derve ya Iraqê kir, da ku daxwaznameyekê radestî Konseya Ewlekarî ya Neteweyên Yekbuyî bike û têda daxwaz bê kirin ku binpêkirinên leşkerî yên welatên Herêmê yên li ser Iraqên bên qedexe kirin.



# Dayîka Emîne çanda destar diparêze

***Destar li Rojhilatanavîn û bi taybetî jî li Kurdistanê yek ji amûrekî sereke yên sembola çandê ye. Destar xwedî dîrokeke qedîm e. Ev çand kêm be jî lê hê jî berdewam dike. Jina ji Til Temîr Emîna Îsa dibêje ku parastina vê çandê ji bê wê wezîfeyeke.***



Di çanda kevnar a Rojhilatanavîn de destar xwedî cihekî girînge û ev çand li Kurdistanê heta roja îro hê jî dewam dike. Emîne Îsa jî vê çandê diparêze û zindî dihêle.

Emîne Îsa ya 57 salî ku ji pêkhateyên Ereb e ,5 zarokên wê hene û yek ji jinên gundê Til Farûq e. Destar ji dapîr û baîrên wê jê re mîrate maye û her karê xwe yê hêranê bi destar dike. Emîne ji bo ku çanda dapîr û bapîran nede jibîrkirin heta ji destê wê tê vê çandê diparêze.

Emîne diyar kir ku çanda mirov dîroka mirov e û wiha got, "Ji zaroktiya min de dayika min min fêrî bikaranîna destar kir. Wê demê hemû jinan bi destar pêdiviyên xwe ya hêranê bi cih dianî. Lê niha ev çand gelek kêm bûye. Sedema wê jî pêşketina teknîkê ye. Pêşketina teknîkê girîng e lê nayê wateya ku mirov dûrî çanda xwe ya resen bikeve, ji ber ku parastina çandê, parastina nasnameya mirov e. "

Emîneyê di berdewamiya xwede wiha got, "Gelek caran cîranên min destar dixwazin ji bo ku genim an jî nîskan pê bihêrin. Ez bi kêfxweşî destar didim wan. Ji ber ku ez dixwazim ev çand têk neçe. Ez ji bo malê genim û nîskan pê dihêrim. Tema tiştên bi destêr tên hêran jî cuda ye.

Emîneyê di dawiya axftina xwe de wiha got, "Ez ê heta dawî çanda xwe biparêzim û erka her jinekê ye ku çanda xwe bi parêze. Ji ber ku çand bi destê jinê hatiye afrandin û çand ji çandiniyê hatiye."…

*JINNEWS*

## Albuma xwe diyar Sakîne, Leyla û Fîdan kir




Albuma Ferîforya ya hunermend Şêrzad Mîr Muzîkê derket.

Albuma Ferîforya ya hunermendê Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) Şêrzad ji Kom Yapim û Mîr Muzîkê derket.

Hunermend Şêrzad albuma xwe diyarî şoreşgerên Têkoşîna Azadiyê ya Kurd Sakîne Cansiz, Leyla Şaylemez û Fîdan Dogan kir ku 9'ê Çileya 2013'an li Parîsê hatin kuştin. Hunermendê ciwan Şêrzat li ser albuma xwe ya bi navê Ferîforya axivî.

Hunermend Şêrzat diyar kir ku şehadeta Sakîne, Leyla û Fîdan gelekî bandor li wî kir û got, "Dema ku li girtîgehê ez bi şehadeta wan hesiyam, min rahişt tembûra xwe û êş û kedera xwe anî ziman. Berhema Ferîforya bi vî rengî derkete holê. Ferîforya li navçeya Sasonê ya Êlihê naveke ku li pinpinîkan tê kirin. Vî navê bedew û estetîk xweş li têkoşîna pîroz a şoreşgerên Kurd Sakîne, Leyla û Fîdan dihat. Lewma min navê Ferîforya li albumê kir. Bi pêşniyara dostên hêja yên li zindanê me biryar da ku vî navî li albumê bikin."

Hunermend Şêrzat anî ziman ku album ji 12 stranan pêk tê û keda bi dehan hevrêyên wî yên li zindanê di nav albumê de heye.

Hunermendê NÇM'ê Şêrzat got, bi vê berhemê re kêm jî be wî xwestiye tevkariyê li têkoşîna wan a şoreşgerî bike.

Hunermendê ciwan destnîşa kir ku ev berhema kolektîf ji bo wî cihê rûmet û serbilindiyê ye…

*ANF*

## Çanda Kurd bi Swîsreyîyan didin nasîn



Li festîvala Streetfoodê ku li bajarê Aaraû yê Swîsreyê tê lidarxistin, çanda Kurd ji Swîsreyiyan re tê nasandin.

Festîvala Streetfood (Xwarina li kolanan a cîhanê) bi rengekî kevneşop her sal li gelek welatan tê lidarxistin. Di festîvalê de çand û gelên cuda li hev kom dibin.

Li festîvalê, tevî çand û xwarina Swîsreyê, mutbexa gelek herêmên cîhanê jî tê naskirin. Meclîsa Jinan a Rojbîn a Aaraû jî îsal bi xwarinên Kurdan tevlî festîvalê bû.

Di festîvalê de dansên ji welatên cuda jî tên pêşkêşkirin. Koma Govendê ya Zarokan a Çanda Med jî hunera xwe pêşkêş kir û gelekî bala Swîsreyiyan kişandin.

Festîval li qada Einkaufszentrum Telli tê lidarxistin û wê îro biqede. Meclîsa Jinan a Rojbîn bang li Kurdistanî û dostên wan kir ku ji bo danasîna çanda Kurdan wan bi tenê nehêhilin.

## Bi boneya cejnê pêşengeha cil û bergên kurdî





Desteya Çand û Huner û Tevgera Kevana Zêrîn a Navenda Çand û Hunera Waşûkanî ya Serêkaniyê bi boneya Cejna Qurbanê pêşengeha cil û bergên kurdî vekir.

Di pêşengehê de cil û bergên kurdî, wêneyên bi dest hatin xêzrkin, tiştên jinan ên xemilandinê, cilên zarokan û tiştên malxemilandinê yên ku bi destan hatine çêkirin hatin pêşkêşkirin. Di heman demê de zarokan cilên ku terzî çêkirine nîşanî gel dan.

Rêvebera Tevgera Kevana Zêrîn Gulnaz Derwêş derbarê pêşangehê de agahî da û diyar kir ku armanca wan a ji pêşengehê ew e ku cil û bergên kurdî di nav gel de wek çand û modelekê bi pêşbikevin. Gulnaz bal kişand ser ked û xebatên terziyan û wiha got: "Dîsa em dixwazin bidin nîşandan kesên terzî kedek mezin didin heta ku berhemekê çêdikin. Ji bo ku xwedî li keda wan vwedî derkevin, ev 3 meh e hevalên me ji bo vekirina pêşangehê dixebitin û kedeke hêja dan."

Gulnaz destnîşan kir di heman demê de ev pêşengeh bi boneya Cejna Qurbanê hat li darxistin..

## Li Şingalê bi rêberê qehreman Zekî Şingalî re



Derwêş M.FERHO

Sê sal berê tev komeke rojnamevan û berpirsiyarê saziya aştiyê li Başûr bûm. Paş Hewlêr, Mexmûr û Dihok me xwest herin Rojava. Lê rayedraên herêmê rê nedan. Tiştê ji me re dihat gotin "ew welatekî din e û ewlekariya we nîne!"

Me di nav hev de, bêçare biryar stend ku em di ciyê Rojava de, herin Şingale û li wira rewşê bibînin. Bi çendîn berpirsiyarên herêmê re axivîn û pirs kir. Hemûyan jî got "Şingal, Iraq e û pirsgirêka çûna we nine." Em derketin rê û berê xwe da Şingalê. Di kontrola yekem ya asayişê de pêşmerge rê neda. Hêvî û daxwaza dost û xêrxwazên me yên Ewropî li wira hat şikestin. Pênc rojnamevan û berpirsiyarê saziya aştiyê, pey çend rojan vegeriyan Beljîka.

Ez li Dihok mam. Bi çi awayî be bila bibe, ez li rêyekê digeriyam ku herim Rojava û di Şingalê. Li gundekî Êzdiyan, li ba dostekî mêhvan bûm. Li wira Şemso, dostekî hêja jî, tesadûf mêhvanê heman cî bû. Em di nav xwe de axaftin û me biryar stend bi qaçaxî xwe bighînin Şingalê. Me şoforekî Ezdî ji Şingalê dît. Di heman demê de jî min rêberê hêja, qehremanê çiyayê Şingalê, Zekî Şingalî agahdar kir. "Em sibe sere sibehê li Şerfedînê ne. Paş Qasimê Şeşo bibînin ber bi we tên." Bi vê biryarê pirr kêfxweş bû.

Ev yek jî pirr li zora min diçû. Li welatê xwe bi qaçaxî rêwaniyê bike.

Serê sibehê zû ez, Şemso û şofor ketin rê. Me Qasim Şeşo jî agahdar kiribû. Li Şerfedînê, rewşa civaka şikestî, ji her tiştî bêhêvî, di nav tirseke mezin de jiyan derbes dibû. Hêza leşkerî ya Qasim Şeşo parastina derdorê dikir. Paş mazûlvaniyeke qedirbilind em çûn sere çiyayê Şingalê. Li çiyayê pîroz, bi hezaran penaberên Ezdî hebûn. Bi derfetên kêm, di nav rewşa zor de jiyan ji nuh de ava dikirin. Û Şervanên YBŞ bi her awayî û bi hemû hêza xwe ji van penaberan re pêşengî dikirin. Dema em gihan serê çiyê, li ber konekî kevn de rêber û qehremanê hêja, Zekî Şingalî mîna her car dev bi ken ber bi me hat. Hevdîtineke pîroz bû. Paş sohbet û halpirsînê behsa rewşê kir. Bi çi awayî, bi çi berdêlan û bi çi zor û zehmetiyan vî çiyayê pîroz û civaka Êzdî diparêzin. "Bi hêmû hêza xwe, emê vê civaka êzdî, war û ola wan biparêzin. Ev herêm ji her alî ve hatiye paşxistin, civak şikestiye, zor û zilm ji her alî ve hebû û berdewam e. Çi li me bikeve êmê bikin. Lê hêviyên vê herêmê, vê civakê, ji qada navneteweyî jî hene ku di hember vê wahşetê de bedeng nemînin."

Di dawiya mayina me li wira de got "were ez te bibim ciyekî û binêrim tu çi bêjî." Em birin sere mitikekî, li wira çend xaniyên xerabe hebûn. "Ev Ziyareta Çilmêra ye. Te qet nebihîstiye? Min ji diya xwe dibihîst. Yek ji sunda wê bi ziyareta Çilmera bû". Û li wira xortekî deh-yazdeh salî rahişte tembûrteke kevn û lê da. "Me çi kiriye ji vê dinyayê, ev zor û zilm li sere me peyda ye, bes e êdî êzdîno, xêr ji sertawandinê nîna ye." Zekî Şingalî, bi wê dilnazikbûnê û devken destê xwe di ser sere kurik de bir. "Hemû malbata wî ji aliyê hovên Daişî hatine kuştin."

Bi derengiya şevê re me xwe ji çiyê berda û berê xwe da Dihokê.

# AKP mîna DAÎŞ'ê derbê li Îslamê dixe

**Dîwana Hevserokatiyê ya KONGRA-GEL bi wesîleya cejna qurbanê peyameke weşand û cejn li Kurdistaniyan û alema Îslamê pîroz kir. KONGRA-GEL destnîşan kir ku rejîma AKP'ê û Erdogan mîna DAÎŞ'ê derbeke mezin li ola Îslamê dixe. KONGRA GEL bang li Kurdistaniyan kir ku li dijî vê rejîma faşîst têbikoşin.**

KONGRA-GEL destnîşan kir ku rejîma AKP'ê û Erdogan kujerên gelê Kurd e û mîna DAÎŞ'ê derbeke mezin li ola Îslamê dixe. KONGRA GEL bang li Kurdistaniyan kir ku li dijî vê rejîma faşîst bi rengekî bê navber têbikoşin.
Dîwana Hevserokatiyê ya KONGRA-GEL bi wesîleya cejna qurbanê peyameke nivîskî weşand û cejna qurbanê li Kurdistaniyan û tevahiya alema Îslamê pîroz kir.
Di destpêka peyamê de hate gotin, "Em cejna qurbanê di serî de li Rêber Apo, gelê Kurdistanê û alema Îslamê pîroz dikin. Bi wesîleya vê cejnê hemû şehîdên Kurdistanê bi rêzdarî û minet bibîr tînin.
Gelê me vê cejna qurbanê jî bi tecrîda li ser Rêber Apo û şerekî giştî yê li seranserê Kurdistanê pêşwazî dike. Di van rojan de ji ber şehadeta heval Mam Zekî Şengalî û heval Atakan Mahir, em ji malbatên wan û ji gelê xwe re sersaxî dixwazin. Şehîdên Kurdistanê hêza gelê Kurd in. Gelê me bi şehîdên xwe her tim hêza xwe mezin kir û li ser vê bingehê gihîşt qonaxa serketinê. Bi hezeran Zekî Şengalî û Atakan Mahîr wê li ser şopa wan bimeşin."
KONGRA-GEL bal kişand ser êrîşên dewleta Tirk a dagirker û wiha dewam kir:
"Erdogan ê faşîst bi siyaseta xwe ya li ser bingeha bazirganiya ol û nijatperestiya Tirk, dixwaze hemû nirx û destketên gelê Kurd têk bibe. Lê belê gelê Kurd têk naçe. Berxwedana gelê Kurd her diçe mezin dibe û bi ser dikeve. Erdogan û pergala xwe ber bi têkçûnê ve diçe û wê bi temamî jî têk biçe.
Lewma ev şerê li dijî gelê Kurdistanê tê kirin, aboriya dewleta Tirk jî xistiye nava krîzeke gelekî mezin. Bi vê siyaseta dewleta Erdogan her diçe krîza aboriyê girantir dibe û wê pergala Erdogan jî têk bibe. Bêguman ev krîza aborî ya dewleta Erdogan, bi berxwedana gelê Kurdistanê çêbû û têkçûna wê jî yê bi bilindkirina Tekoşîna Azadiyê çêbe.
Li ser vê bingehê, bi wesîla cejna qurbanê pêwîst e gelê me dilsoziya xwe, hêvî û baweriya xwe mezintir bike. Li însanên xwe yên hewcedar xwedî derkeve. Bi taybetî koçberên Efrînê yên ku li kampên Şehbayê dimînin, pêwîst e em bi maddî û manewî li gel wan bin. Li hemû zi-



yaret û serlêdanên cejna qurbanê de mijara gelê me pêwîst e li ser yekîtî û xwedîderketina li gelê Kurdistanê be."
Dîwana Hevserokatiyê ya KONGRA-GEL di dawiya peyama xwe de bal kişand li ser hevkarên Erdogan û êrîşên wan û got: "Çawa ku DAÎŞ'ê derbeke pir mezin li ola Îslamê da, siyaseta Erdogan jî derbeyeke gelek mezin lê dide û dewamiya xeta DAÎŞ'ê ye. Li hemberî xeta Erdogan a Îslama siyasî, bi têgihêştina îslama rast, bi Îslama demokratik pêwîst e gelê me yê Misliman xwe perwerde û rêxistin bike.
Di vê cejna qurbanê de pêwîst e gelê Kurd vê rastiya Erdogan û AKP'ê her kesî baş bide fêmkirin. Hevaltiya Erdogan û AKP'ê hevkariya kujerên gelê Kurd e. Ji ber ku Erdogan kujerê gelê Kurd e. Hevkariya Erdogan, hevkariya xwarina mafên sêwiyan e; heram e, guneh e. Ji ber vê rastiyê jî gelê Kurd pêwîst e li hemberî dewleta Erdogan a faşîst bi rengekî bê navber li ber xwe bide.
Li ser vê bingehê em careke din Cejna Qurbanê pîroz dikin û hêvî dikin ev cejn bibe wesîleya serketina gelên Kurdistanê."

## Fermandariya Giştî ya Ewlekariya Hundirîn ji bo cejnê hin tedbîr eşkere kir

Bi armanca parastina ewlehiya welatiyên Bakurê Sûriyê, Fermandariya Giştî ya Ewlekariya Hundirîn a Bakurê Sûriyê daxuyaniyeke nivîskî da.
Bi boneya nêzîkbûna cejna Qurbanê û ji bo parastina welatiyên Bakurê Sûriyê, Fermandariya Giştî ya Ewlekariya Hundirîn a Bakurê Sûriyê bi daxuyaniyekê rêze tedbîrên xwe eşkere kirin û banga alîkariyê ji hemû welatiyan kir.
Daxuyaniya Fermandariyê wiha ye:
"Em cejna Qurbanê bi dilekî germ li hemû gelê xwe pîroz dikin. Em ji gelê xwe re cejneke xweş û geş hêvî dikin û aramiyê ji hemû gelê xwe re dixwazin.
Em ji gelê xwe dixwazin ku li gorî van bendên jêrîn ji bo ewlehiyê tevbigerin.
1-Tevgera hemû cûreyên siwareyan ji saet 13:00'an, 19'ê Tebaxa 2018'an roja Yekşemê heta saet 15:00'an 22'yê Tebaxa 2018'an roja çarşemê ye.
2-Tevgera motoskilêtan ku motoskilêtên leşkerî jî digire nava xwe ji saet 8:00 20'ê Tebaxa 2018'an roja Duşemê heta saet 15:00'an 22'yê Tebaxa 2018'an roja Çarşemê qedexe ye.
3-Derbaskirina siwareyan ya bajaran di bendên kontrolê re ji saet 8:00'an 20'ê Tebaxa 2018'an roja Duşemê heta saet 15:00'an 22'yê Tebaxa 2018'an roja Çarşermê qedexe ye.
4-Avêtina guleyan ji aliyê endamên hêzên leşkerî û hemû welatiyan ve qedexe ye.
Em weke Fermandariya Giştî ya Ewlekariya Hundirîn a Bakurê Sûriyê careke din cejna Qurbanê li hemû welatiyên xwe pîroz dikin û cejneke xweş û geş ji wan re hêvî dikin.

## Dewreya 5 hezar mamosteyan bi dawî bû

Komîteya Perwerdeyê ya girêdayî Meclisa Sivîl a Reqayê dewreya havînê ya amadekirina mamosteyan bi dawî kir.
Komîteya Perwerdeyê ya girêdayî Meclisa Sivîl a Reqayê dewreya amadekirina momosteyan bi dawî kir. Dewreya havînê du mehan dewam kir. Di dewreyê de dersên birdozî û dersên li ser materyalên xwendinê hatin dayîn. Ji bo vê yekê şahiyek hate lidarxistin.
Şahî li 3 dibistanan; El-Wehde El-Erebaiye ya taxa El-Mişlib, dibistana Meseb Bin Omer a taxa Rimêla û dibistana Cewad Enzûr a taxa El-Deriye hate lidarxistin.
Endamên Meclisa Sivîl a Reqayê, endamên Buroya Perwerdeyê ya Meclisa Sûriya Demokratîk, Komîteya Jinê û endamên Buroya Malbatên Şehîdan tev li şahiyê bûn.
Di şahiyê de serokê Komîteya Perwerdeyê ya Reqayê Elî El-



Şenan, bi navê Buroya Perwerdeyê ya MSD`ê Receb El-Muşrif, bi navê Meclisa Jinan Buseyna Serhan, bi navê Malbatên Şehîdan Fatma El-Îsa û bi navê Komîteya Perwerdekirinê Abdullrehamn El-Hemûd axaftin hatin kirin.
Di axaftinan de kar û xebatên Meclisa Sivîl a Reqayê û Komîteya Perwerdeyê li ser xurtkirina asta çandî û fêrkirinê û başkirina rewşa dibistanan pîroz kirin.
Paşê şanoyek bi navê "Perwerde piştî şer û xirabûnê" û helbest ji aliyê mamosteyan ve hatin pêşkêşkirin.
Her wiha mamosteyên ku dewreyên havînê bi rê ve dibin, ji aliyê serokê Komîteya Perwerdeyê Elî El-Şenan û endama Komîteya Perwerdeyê Emel El-Şêx ve hatin xelatkirin…*ANHA*

## Welatî pêdiviyên xwe ji sûkên gerok peyde dikin



Sûkên gelêrî yên gerok li bajarê Qamişlo ji beriya 30 salan ve hene. Rojane û li cihên cuda di nav taxên Qamişlo de ku ji bo wan hatine diyarkirin, pêdiviyên malan pêşwazî dikin.
Sûkên gelêrî li bajarê Qamişlo beriya nêzî 30 salan ve hatine pêşxistin. Di destpêkê de bazirgan û firoşkar ji Heleb, Reqa û Dêrazor û tevî yên bajêr jî li cihên fireh amûrên xwe difirotin. Ew sûk bi navên rojên hefteyê tê nasîn.
Ji ber kêmbuhayên amûran welatî berê xwe didin van sûkan. Şêniyên Qamişlo bi vê pîşeyê dixebitin û niha hemû firoşkar û bazirganên sûkê ji Qamişloyê ne. Ev sûk gelekî berfireh bûn. Ev sûk ji ber şerên li herêmê û qutbûna rê bi herêmên Sûriyê re, rawestiyan. Lê niha Şaredariya Gel a bajêr roleke girîng di geşbûna van sûkan de lîst. Cihên taybet di nav taxên bajêr de û bi erzanî ji bo wan amadekirin. Piraniya van bazirganan nikarin dikanekê bikirin an jî kirê bikin.
Firoşkarê bi navê Ebdillah Hisên Osman diyar kir ku ew ji beriya 22 salan ve di nav sûka gerok de wek firoşkarê solan li sûkê dixebite… *ANHA*



# Jinan ji bo azadiya Ocalan daxuyanî dan

***Kongra Star û Meclîsa Jinan a PYD'ê yên bajarê Helebê ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daxuyanî dan. Daxuyaniyan de hat gotin ku Ocalan hêviya gelên bindest û bang li rêxistinên navnetewî hatin kirin ku li dijî tecrîdê bi erkên xwe rabin.***

Kongra Star û Meclîsa Jinan a PYD'ê yên bajarê Helebê ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û azadiya wî 2 daxuyaniyên cuda dan.
Di her du daxuyaniyan de bang li rêxistinên mirovî û hiqûqî û Neteweyên Yekbûyî hate kirin ku bi berpirsyariyên xwe rabin û rê li pêşiya destdirêjiyên Tirkiyê bigirin.
Di çarçoveya qonaxa sêyemîn a hemleya "Em ê sîstema Îmraliyê hilweşînin û bi rêberê xwe re azad bijîn" de ya ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku Kongreya Star daye destpêkirin, 2 daxuyanî hatin dayîn.
Endamên Kongreya Star ên bajarê Helebê û endamên jin ên komînan li pêşiya navenda Weqfa Jin a Perwerde û Pêşxistina Hişmendiyê kom bûn û alên Kongreya Star û wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bilind kirin. Endama Buroya Têkiliyên Dîplomasî ya



Kongreya Star a bajarê Helebê Leyla Xalid daxuyaniyek xwend.
Di heman çarçoveyê de endamên Rêxistina Jinan a Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) ya bajarê Helebê daxuyaniyek da. Daxuyaniya PYD'ê jî ji aliyê Fatme Qunyekî ve hate xwendin.
Di her du daxuyaniyan de hate gotin ku dewleta Tirk li dijî gelê Kurd destdirêjiyên herî qirêj pêk tîne û ji aliyekî din ve jî tecrîda xwe li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan didomîne.
Di daxuyaniyan de hate gotin ku tu carî kesayetên wekî Rêber Ocalan nayên girtin û wiha hate gotin: "Fikra Ocalan di nava gelên bindest de belav dibe."
Di daxuyaniyan de hate gotin ku hêzên komploger xwestin bi girtina Ocalan rêgezên mirovî û exlaqî têk bişikînin, lê bi saya felsefeya Ocalan bi milyonan şopdarên Ocalan derketin. Di daxuyaniyan de her wiha hate gotin ku êrîşa artêşa Tirk li dijî Şengalê nîşana têkçûna wê ye piştî ku hemû siyasetên wê li Sûriyê hatin têkşikandin
Di her du daxuyaniyan de tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Ocalan bi tundî hat şermezarkirin, her wiha bang li rêxistinên mirovî, hiqûqî û Neteweyên Yekbûyî kirin ku bi berpirsyariyên xwe yên mirovahî û exlaqî rabin û rê li pêşiya destdirêjiyên dewleta Tirk bigirin.
Daxuyanî dirûşmên wekî "Bê serok jiyan nabe" û "Jin jiyan azadî" bi dawî bûn.

## Em ê li ser rêya Mam Zekî bimeşin



Jinên Başûrê Kurdistanê nerazîbûn nîşanî êrîşa dewleta Tirk ya li ser Şengalê dan û diyar kirin ku ew ê li ser mîrasa ku Mam Zekî hiştiye têkoşînê bilind bikin.
Hikûmeta AKP'ê ji bo desthilatiya xwe li ser piyan bigire, polîtîkaya xwe ya şer a li dijî Kurdan de berdewam dike.
AKP ku niha Tirkiye xistiye nava krîzeke aborî ji bo van binkeftinên xwe veşêrê roja 15'ê Tebaxê êrîşê Şengalê kir û di encam de Endamê Kordînasyona Civaka Êzidî Zekî Şengalî şehîd bû. Jinên ji Şengalê, Qendîlê û ji Rojhilatê Kurdistanê êrîş şermezar kirin û diyar kirin ku ew ê rêya têkoşînê ya Mam Zekî berdewam bikin û dijminê xwe kêyfxweş nekin.
Sara Şengalî: "Ez rêheval Zekî ku di encama sûîkasta dewleta Tirk de şehîd bû bi rêzdarî bi bîr tinim. Ez ev êrîşa dewleta Tirk a bi hevkariya nokeran pêk aniye şermezar dikim. Nirxekî cûda yê Mam Zekî ji bo Êzidiyan heye. Xwestin di şexsê Mam Zekî de femraneke din a nû li ser Êzidiyan pêk bîne. Lê, divê dijmin bizanin ku emê li ser rêya Mam Zekî bibin lehî û biherikin. Em ê şîna wî vegerin têkoşîn û berxwedanê."
Xane Sor: "Dewleta Tirk ku afrînerê DAÎŞ'ê ye, bi dûbarekirina komkujiya Şengalê hewl didin me bi tirsînin. Wê gelê Êzidî ji van êrîşan ne tirsin. Em ê weke jinên Êzidî parastina xwe bikin û xwe bi Sîstema Xweser a Demokratîk bihêz bikin."
Azeta Egîd: "Xwestin di roja vejîna Kurdan 15'ê Tebaxê de bi êrîşa li ser Şengalê re derbeyek li vê rojê bixin. Mam Zekî di êrîşa dagirkeran de şehîd bû. Em ê van planên qirêj li çar parçeyên Kurdistanê têk bibin. Em ê di rêya Rêber Apo û Mam Zekî de biçin û dijminê xwe qet kêyfxweş nekin. Bêdengî û bê helwestiya hikûmeta Iraqê lanet dikim."
Siwêyda Resûl: "Wê êrîşên dewleta Tirk me qet ne tirsîne. Di bombebaranên Qendîlê zevî û baxên me zirer dîtin. Divê em li dijî ev êrîşên li ser axa Başûr, hev bigirin. Ez ji vir bang li dijmin dikim, em natirsin, em ê di rêya şehîdan û Rêber Apo de bimeşin. Em ê bi ew mîrasê ku Mam Zekî ji me re hiştiye têkoşînê bilind bikin."…
*ROJNEWS*

## Azadiya Abdullah Ocalan êdî ferz e

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li zîndana Îmraliyê di bin tecrîdeke girankirî de ye û ti agahî jê nayên girtin.
Parêzer Newroz Uysal diyar kir ku tecrîda li Îmraliyê tê meşandin li cihekî din tune û anî ziman ku azadiya Abdullah Ocalan êdî ferz e.
Hevdîtinên parêzeran ên bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re ji 27'ê Tîrmeha 2011'an heta niha bi hincetên cuda tên astengkirin. Ji îlona 216'an heta niha jî Rêber Ocalan bi malbata xwe re jî nikare hevdîtinê bike.
Parêzer Newroz Uysal derbarê astengkirina hevdîtinan û tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de wiha axivî.
"Em ji Birêz Abdullah Ocalan û sê kesên li ba wî bi salan e agahiyê nagirin. Ji 1999'an heta niha em pêvajoya tecrîdê vebêjin jî her diçe bi polîtîkayan re em bi girtîgehek giravê ya bêdeng re rû bi rû ne. Em bi tu awayî têkiliyê nikarin deynin. Em nikarin bi tu awayî pîşeya xwe ya parêzeriyê bînin cih û mafê herî sereke û rêgezên netewî û navneteweyî tune hatine hesibandin. Ligel vê Birêz ocalan yê bi salane tenê jiyana xwe didomîne li wir e. Ev 8 sal e em nikarin hevdîtinê bikin."
Parêzer Newroz diyar ki ku mînaka tecrîda li Îmraliyê li devereke din a cîhanê tune ye û wiha dewam kir, "Ev mînakek tecrîdê ya ku li tu derê cîhanê tune ye. Bi OHAL'ê re KHK hatin derxistin. Piştî îlankirina OHAL'ê şûnde ya ewil hat kirin hat xwestin ku pêşî li ragîhandina li Îmraliyê bê girtin. Me serî li merciyên têkildar û Dadgeha Destura Bingehîn da. Me ev rewş ji saziyên têkildar û CPT re ragîhand. Lê niha OHAL ne mijara gotinê ye."
Newroz derbarê jiyana rojane ya li Îmraliyê de jî got, "Bi biryara nû hatiye girtinê re bi qanûnîbûna biryara ku bingeha xwe ji KHK'ê digire re mafên ragîhandina 3 girtiyê bi 3 mehan hatiye sînorkirin. Derbarê parêzeran de qedexe-



yek vekirî ne mijara gotinê be jî em hîna wek parêzerên wî nikarin pê re hevdîtinê bikin. Em her hefte wek malbat û parêzer serlêdanan dikin. Ji îlona 2016'an heta niha me bi tu awayî ji girtîgeha Îmraliyê agahî negirtiye. Hemû têkilî û hevdîtin hatin qûtkirin. Bêdengî heye."
Ji bo hewldana rakirina tecrîdê jî Newroz wiha got, "Ji bo em vê çareser bikin em hemû serlêdanên xwe didomînin. Lê êdî ev diyare ku azadiya Birêz Abdullah Ocalan ferz e."…
*JINNEWS*

# Di asteke bilind de dest li Tirkiyê tê werdan

**_Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Riza Altûn li ser krîza navbera Tirkiye û Amerîkayê axivî diyar kir ku di asteke ku heta niha nehatiye kirin dest li Tirkiyê tê werdan. Altûn wiha got, "krîz gelekî kûr e lê belê zîhniyeta li Tirkiyê hewl dane fêhm bike û çareser bike. AKP ji sîstemê dixwaze ku ew li derveyî guherîna li Rojhilata Navîn bê hiştin. Lê belê ev yek li projeya moderniteya kapîtalîst a li ser Rojhilata Navîn nayê."_**

Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Riza Altûn destnîşan kir ku krîzên gelekî giran li ber Tirkiyê ne û got, "Tirkiye birîndar e û roj bi roj xwîn jê diçe."

Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Riza Altûn li ser krîza navbera Tirkiye û Amerîkayê axivî diyar kir ku nakokiya navbera Tirkiye û Dewletên Yekbûyî yên Amerîka (DYA) bi giranî bi têkçûna tifaqa li ser projeya 'perwerde bike-bi çek bike' dest pê kir û got, "Erdogan xwest li ser bingeha hin derfetên nû yên derketin holê hîn bêhtir li Rojhilata Navîn serwer bibe. Ev yek bû sedem ku nakokiyên navbera wan dest pê bike."



### DAXWAZÊN DYA Û TIRKIYÊ LI HEV NAKIN

Altûn da xuyakirin ku daxwazên Tirkiye û DYA'yê li hev nakin û ev tespît kir: "Eger DYA daxwazên Tirkiyê qebûl bike, wê neçar bimîne ku dest ji polîtîkayên xwe yên li Rojhilata Navîn biqere. Ji ber ku Tirkiye ji DYA'yê dixwaze ku statuya li Rojhilata Navîn bê parastin û Tevgera Azadiyê ya Kurd were tasfiyekirin. Wateya vê yekê ev e: 'Tu yê dest nede Îranê, Sûriye wê li rewşa xwe ya berê vegere, Kurdên ku di guhertina qismî ya Rojhilata Navîn de bi dayina berdêlên giran rol lîstin wê bê tasfiyekirin'. Eger DYA vê yekê qebûl bike, wê bibe amûreke erzan a li ber destê Tirkiyê. Halbûkî hêza hegemon a ku dest li herêmê werdide DYA ye. DYA jî ji Tirkiyê dixwaze ku li gorî polîtîkayên wê tevbigere. Wateya vê jî ev e: 'Di mijarên Îran, Rûsya û Sûriyê de tu yê li gorî polîtîkayên DYA'yê tevbigere'."

### XWÎN JI TIRKIYÊ DIHERIKE

Riza Altûn işaret bi vî aliyê krîzê jî kir: "Tirkiyê li ser bingeha dijberiya li DYA û Îranê bi Rûsya û Îranê re têkilî danî û ev têkilî jî weke şantajekê bi kar anî. Ji ber ku encameke pozîtîf di destpêkê de ji vê têkiliya ji bo şantajê nehat bidestxistin, Tirkiyê vê carê ev têkilî kûrtir kir ji bo encamekê bi dest bixe. Anî wê radeyê ku vegera ji vê yekê wê lê bibe barekî giran. Ji ber vê yekê, di rewşa heyî de ne dikare bi hêsanî û bê berdêl ji têkiliyên bi Rûsya û Îranê vegere, ne jî dikare bi hêsanî û piştrast bi DYA û Yekîtiya Ewropayê re hevkariyê bike. Birîndar bûye û her roj xwîn jê diçe. Pêçandina birînên Tirkiyê ne li hesabên DYA'yê tê, ne jî li yên Rûsya û Îranê. Li Tirkiyê jî zîhniyet, feraset û siyaseteke ku karibe birînên xwe bipêçe nîne."

### DEST LI TIRKIYÊ TÊ WERDAN

Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Riza Altûn destnîşa kir ku krîza nabera Tirkiye û Amerîkayê gelekî giran e û wiha dewam kir: "Ne krîzeke ji rêze ye. Pêwendiya xwe bi sîstema cîhanê û krîza Rojhilata Navîn re heye. Di vê çarçoveyê de ya Tirkiye wê mîna berê bibe parçeyekî pêbawer ê sîstema nû ya cîhanê, ya jî di vê mijarê de wê krîzên girantir derkeve pêşiya wê. Ya ku diqewime ev e. Lewma dema ku mirov bala xwe bidê, wê were dîtin ku asta krîza li ser rahîb dest pê kir, ji bûyerê pir pir bilindtir e. Di asteke ku heta niha nehatiye kirin dest li Tirkiyê tê werdan. Destwerdaneke giran a aboriyê heye. Lê ev destwerdan ne tenê ji aliyê aborî ve ye. Destwerdanek ji wê jî wêdetir e. Berê heta radeyekê dest li Tirkiyê dihate werdan. Lê destwerdan ti carî veneguherî helwesteke bi vî rengî zelal. Ambargoya aborî ya li ser Tirkiyê tê ferzkirin û kêmbûna qîmetê lîre li pêşberî dolar, di vê çarçoveyê de ye. Tevî ku bê navber pere pêşkêşî bazarê tê kirin jî krîz çareser nabe. Li ser bazirganiyê, gumrukê û gelek qadên din ambargo li ser hev tên. Ev ambargo li ser berdan an jî neberdana rahîb hatiye girêdan. Her kesên bi aqil zane ku buhayê rahîbekî ewqasî nîne. Lê rahîb niha weke hincetekê di têkiliyên navbera Tirkiye û Amerîkayê de cih digire. Lê pirsgirêk ji vê kûrtir e."

Altûn diyar kir, pirsgirêk ew e ku Tirkiye bi çi rengî divê li nava sîstema cîhanê cih bigire û got, "DYA vê yekê ferz dike, Tirkiye jî li ber radibe."

### GUHERTIN LI SER TIRKIYÊ TÊ FERZKIRIN,


Altûn ragihand, di navbera daxwazên Tirkiyê û rewşa ku emperyalîstên cîhanê afirandiye de pirsgirêk heye û got, "Tirkiye dixwaze mîna dema bihurî, sîstema wê ya netewe-dewletê li her qadê ewle be. Tevî ku pirsgirêkên demokratîkbûnê, pirsgirêkên civakên etnîkî, pirsgirêkên olî û pirsgirêka Kurd dewam dike jî, Tirkiye dixwaze sîstema wê ya heyî bê parastin.

AKP ji sîstemê dixwaze ku ew li derveyî guherîna li Rojhilata Navîn bê hiştin. Tevî vê yekê dixwaze weke hêzeke hegemonîk li herêmê bimîne. Vê yekê ferz dike. Lê belê ev yek li projeya moderniteya kapîtalîst a li ser Rojhilata Navîn nayê. Li cîhanê ya jî Rojhilata Navîn nepêkan e ku daxwazên bi vî rengî yên welatekî bê qebûlkirin. Sedema bingehîn a krîzê ev e. Guhertin li ser Tirkiyê tê ferzkirin. Tirkiye jî xwe nade ber. Me ev yek di pratîka Sûriyê û ya berî wê de dît. Nakokî di vî alî de bi zelalî derket holê. Tirkiye ji her alî ve veguherî desthilatdariyeke faşîst. Bû xwedî siyaseteke li ser bingeha dijminatiya li Kurdan. Ji bo dijminatiya li Kurdan bi hin hêzan re têkilî danî. Bi van têkiliyên xwe bû navenda siyaseta herêmî û navneteweyî."

### HEWL DIDE JI KRÎZÊ SÛDÊ WERBIGIRE

Altûn anî ziman ku krîz gelekî kûr e lê belê zîhniyeta li Tirkiyeyê hewl dane fêhm bike û çareser bike. Altûn got, "Li şûna çareseriyên rasteqîn, jê heye ku bi sûdwergirtina ji krîza li cîhanê û Rojhilata Navîn wê karibe encamekê bi dest bixe. Ji bo vê jî dixwaze ji polîtîkayên rojane sûdê werbigire. Wê wextê jî siyaseta rojane jê re gelekî girîng tê. Ji ber ku li Rojhilata Navîn siyaseta rojane kir, gelek caran têk çû û felaket bi serî hat. Efrîn mînaka vê yekê ye, lê belê pêvajoya berî Efrînê jî bi vî rengî ye. Di polîtîkaya Rojhilata Navîn de îflas kir."…*ANF*

## Projeya Rêveberiya Xweser fersendeke dîrokî ye



Esed El-Ebadî destnîşan kir ku projeya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ku li Bakurê Sûriyê pêk hatiye, ji bo gelên herêmê fersendeke dîrokî ye û bang li rêjîma Sûriyê kir ku bi erênî nêzî projeyê bibe. El-Ebadî wiha got: "Projeya Rêveberiya Xweser xeyal bû û niha li ser erdê pêk tê. Lewre jî pêwîst e ev tecrube li tevahî Sûriyê û herêmên din wekî Iraqê pêk were."

Çalakvanê siyasî û hiqûqnas Esed El-Ebadî têkildarî tecrubeya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a li herêmên Bakurê Sûriyyê hatiye rûniştandin axivî û diyar kir ku ev tecrube serkeftî ye.

El-Ebadî anî ziman ku ew ji bo serdana Bakurê Sûriyê ji aliyê Desteya Derve ya Kantona Cizîrê ve hat vexwendin û wiha got: "Piştî derbasî Rojava bûm û min serdana saziyên rêveberiya xweser û bi rayedarên desteyên xizmetguzarî, tenduristî û perwerde hevdîtin kir, min dît ku projeya rêveberiya xweser xwedî hêz e, li ser bingehê wê gel xwe bi rêxistin dike."

El-Ebadî destnîşan kir ku gelê Rojava û Bakurê Sûriyê projeya rêveberiya xweser fam kir û bêyî cudahiyên etnîkî û olî bû xwedî biryar û wiha dewam kir: "Rêveberiya Xweser xewn kir rast, gelek kêmasî derbas kirin, ji ber nakokiyên di navbera pêkhateyan derketin rastî keleman hat."

El-Ebadî anî ziman ku gelek lêkolîneran texmîn kir ku dê li Bakurê Sûriyê şerekî navxweyî derkeve û ev tişt bi lêv kir: "Encamên texmînên wan berevajî derketin, me dît ku gelê Bakurê Sûriyê rêveberiya xweser qebûl kirin û bi xwe, herêmên xwe bi rêve bibirin. Serkeftina rêveberiya xweser piştî ked û westandin hat, ji ber ku gelê bi biryara xwe de bi israr bû, hemû li welatekî bi hev re dijîn."

Têkildarî pêşeroja Sûriyê û çareserkirina aloziyê, El-Ebadî wiha got: "Heger rêjîm tecrubeya li herêmên Bakurê Sûriyê negire, tu guhertin wê li qada Sûriyê rû nede û alozî wê dirêj bike. Tecrubeya rêveberiya xweser fersendeke dîrokî ye. "

Li ser hevdîtinên MSD û rêjîma Sûriyê, El-Ebadî hevdîtin gaveke erênî ber ber pêşeroja Sûriyê bi nav kir.

Çalakvanê siyasî û hiqûqnas Esed El-Ebadî di dawiyê de got tecrubeya rêveberiya xweser bingeha modela neteweya demokratîk e û hêvî kir ku ev tecrube li tevahî Sûriyê, dewletên derdorê û Iraqê pêk were…*ANHA*

## Plana qirêj a MÎT'ê ya li ser PJAK'ê



Çend roj berê nav û wêneyên rayedarên PJAK û KODAR'ê li ser tora medya civakî hatibûn weşandin û hatibû îdîakirin ku "rêveberiya Îranê ji bo kuştina wan xelatê dide." Tê gotin ku ev plan ji aliyê MÎT'ê ve hatiye amadekirin.

Çend roj berê nav û wêneyên rayedarên PJAK û KODAR'ê li ser tora medya civakî hatibûn weşandin û hatibû îdîakirin ku "rêveberiya Îranê ji bo kuştina wan xelatê dide." Malpera Bitawan ku nêzî hêzên Spay Pasdaran a Îranê ye, nivîsand ku ev yek plana MÎT a Tirk e.

Nav û wêneyên Hevseroka PJAK'ê Zîlan Vejîn, Hevserokên KODAR'ê Fûat Bêrîtan û Zîlan Tanya, endamên Meclîsa PJAK'ê Amed Şaho, Baran Bêrîtan, Mazlûm Heftan û Hîva Argeş li ser hesabên Telegram û medya civakî hatibûn weşandin û hatibû îdîakirin ku "Îran ji bo kuştina wan xelatê dide".

### 'PLANA MÎT'Ê YE'

Malpera nûçeyan a bi navê Bitawan ku nêzî hêzên Spay Pasdaran a Îranê ye li ser mijarê nûçeyek weşand. Di Nûçeyê de hate ragihandin ku ev plan plana rêxistina îstîxbaratê ya Tirk MÎT'ê ye. Di nûçeyê de hate gotin, dewleta Tirk mîna lîsteya li ser rêveberên PKK'ê amade kir, yek li ser rêveberên PJAK û KODAR'ê jî amade kiriye û bi kuştina çend ji van kesan dixwaze agirbesta navbera Îran û PJAK'ê ya sala 2011'an xera bike û şer derxîne qonaxeke nû.

Tê gotin ku MÎT dixwaze vê plana xwe li cihên mîna Silêmaniye, Ranya, Sengaser û Qeladizê ku di kontrola YNK'ê de ne, bi cih bîne. Di nûçeyê de hate bibîrxistin ku dewleta Tirk demeke dirêj e mîna PDK'ê dixwaze YNK'ê jî di operasyonên dijî PKK'ê de bi kar bîne.



# Hezaran kesî azadiya Ocalan xwestin

**_Li bakurê Sûriyê meş û çalakiyên ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dewam dikin. Bi hezaran welatiyên Efrîn û Şehbayê bi meşeke mezin azadiya rêber Ocalan xwestin. Meşa ku veguherî mîtîngê de axaftin hatin kirin û tecrîda li ser Ocalan hat şermezar kirin. kesên axivîn diyar kirin ku wê têkoşîna wan ji bo azadiya Ocalan dewam bike._**

Li kantona Şehbayê bi tevlêbûna bi hezaran welatiyên Efrîn û Şehbayê tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalah bi meşekê hate şermezarkirin.



Welatiyan di meşê de wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, wêneyên şehîdan rakirin û ji rawestgeha di navbera gundên Til Qerah û Til Sosîn de dest bi meşê kirin û di meşê di ji bo Ocalan dirûşme avêtin.

Meş li qada Serdemê veguherî mîtîngê.

Rêveberê TEV-DEM'ê Hesen Koçer li wir axivî û destnîşan kir ku gel ji bo azadiya Ocalan kom bûye, tevlêbûna mezin a ji bo meşê nîşaneya serkeftina projeya netewa demokratîk û biratiya gelan e.

Hesen Koçer anî ziman ku sedema tecrîda li ser Ocalan ew e ku Tirkiye ji fikirê Ocalan ditirse.

Endama Koordînasyona Kongreya Star Hêvîn Silêman bi navê jinên Efrîn û Şehbayê soza şopandina xeta Ocalan û şehîdan da û destnîşan kir ku wê jin bersiva her êrîşan bide û civakeke azad û demokratîk ava bike.

Hevserokê Meclisa Kantona Şehbayê Îmad Dawûd jî got, "Komployên li djiî gelê azad û demokrasîxwaz ji Îmralî heya Efrîn û Şengalê encamên pilanên têkbirina îradeya gelê herêmê ye. Ev komplo îradeya me naşkîne em ê xeta azadî û demokrasiyê berdewam bikin."

Mîtîng bi dirûşmeyên azadiya Ocalan û şermezarkirina dewleta Tirk bi dawî…*ANHA*

## Şehîdkirina Mam Zekî dewama fermanê ye

Platforma Baweriyan a Mezopotamyayê kuştina Mam Zekî Şengalî weke dewama fermana li dijî Êzidiyan bi nav kir.

Platforma Baweriyan a Mezopotamyayê ku ji saziyên; NAV-YÊK, FEDA, CÎK, Kongreya Gelan a Mezopotamyayê-Asûrî/Suryanî pêk tê, li ser kuştina Mam Zekî Şengalî daxuyaniyeke nivîskî weşand.



Di daxuyaniyê de hate ragihandin, dewleta Tirk bi hevkariya rêveberiyên Bexda û Hewlêrê êrîş biriye ser Şengalê û hate gotin, kuştina Şengalî dewama ferman û qirkirina civaka Êzidî ye.

Platformê diyar kir, faşîzma Erdogan-Bahçelî êrîşî hemû gel û baweriyan dike û kuştina yek ji fermandarên HPG'ê Atakan Mahîr û Zekî Şengalî weke dewama "êrîşên barbarî" nîşan da.

Di dawiya daxuyaniyê de hate gotin, "Bi navê Platforma Baweriyan a Mezopotamyayê, di şexsê van her du şehîdên xwe yên pêşeng û gelparêzên hêja de em hemû şehîdên xwe bi rêzdarî bi bîr tînin û soza xwe dubare dikin ku em ê li ser şopa wan bin."

## Rêveberiya demokratîk a Êzidiyan tirs xistiye dilê hêzên paşverû

KCD, TJA, HDP û DBP'ê bi daxuyaniyek hevpar êrîşa li dijî Endamê Koordînasyona Êzidiyên Şengal û endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Zekî Zengalî (Îsmaîl Ozden) şermezar kirin. Nûnerên saziyan diyar kirin ku ev êrîş di şexsê gelê Êzidî yên ku gefa komên DAIŞ'ê li ser hemû gelan avakiribû ji holê rakirin, ji bo mirovahiyê têkoşîneke bêhempa meşandine û berdêlên mezin dane, li hemberî hemû civakên navneteweyî pêk hatiye dinirxînin.

Daxuyaniya ku li salona Konferansê ya Vedat Aydin a avahiya HDP'ê ya Amedê hat dayîn de Endamên Meclisa Daykên Aştiyê, nûnerên KCD, HDP, DBP, TJA, OSP, nûnerên rêxistinên sivîl û civakî, parlamenterên HDP'ê û gelek navên cuda amade bûn.

Li ser navê nûnerê Saziyên civakî û partiyên siyasî Hevserokê KCD'ê Berdan Ozturk daxuyanî xwend. Ozturk, diyar kir ku hêzên emperyal ên navneteweyî ku çavên xwe ji pêkanîn û polîtîkayên qirkirinê yên dewletên herêmî li ser gelê Êzidî dimeşîne digirin, bi teşwîqkirin û di bin parastina wan de her roj van polîtîkayên xwe bênavber didomînin û wiha got: "Rojhilata Navîn a ku bûye navenda şerê ol û mezheban, herî zêde gelê Êzidî wekî qurbana van şeran hilbijartine. Bi 73 fermanên herî hovane û wehşî xwestin bi komkujiyan gelê Ezidî tune bikin."

Ozturk, destnîşan kir ku endamên DAIŞ'ê çar sal berê bi çavgirtina hêzên emperyal ên navneteweyî û bi desteka hin dewletên herêmê êrîşî bajarê Kurdên Êzidî yê pîroz û qedîm Şengalê kirin û wiha axivî: "Li wir komkujiyeke mezin pêkanîn. Bi hezarana jinên Êzidî yên Kurd ji hêla çeteyên DAIŞ'ê ve hatin revandin û li bazarên koleyan hatin firotin. Lê ligel vê zilmê jî gelê me yê Êzidî li ber xwe dan, xaka xwe ya pîroz parastin û ji bo azadiya xwe bi dest bixin dest bi seferberiya înşakirina civaka demokratîk kirin. Bi pêşengiya jinên Êzidî parastina xwe ya cewherî avakirin û xaka Êzidî bi temamî ji çeteyên terorê yên DAIŞ'ê paqij kirin."

Ozturk, da zanîn ku ji ber ku Kurdên Êzidî bi hêz û vîna xwe ya xweser li ser bingeha sîstemeke demokratîk û azadîxwaz rêveberiya xwe ava kiriye, tirs û xof xistiye nav dilê hêzên paşverû yên herêmî ku destek dane çeteyên DAIŞ'ê û wiha berdewam kir: "Paşverûya Rojhilata Navîn hewl dide polîtîkayên êrîşkarî yên li ser gelê me yê Êzidî didin meşandin bi şêwazên cûda bimeşînin û didin meşandin. Gelê me û civaka navneteweyî, daxuyaniyên êrîşkarî û amadekariya destwerdanê yên tifaqa nîjadperest AKP-MHP'ê ku ev saleke li hemberî Şengalê tînin ziman ji nêz ve dişopînin. Çeteyên DAIŞ'ê di 14'ê tebaxê de li gundê Koçoyê komkujî pêk anî bû, çend roj berê balafirên şer ên tirk êrîşî konvoya ji bîranîna salvegera komkujiyaê vedigeriyan, kirin. Bi vê êrîşê hat dîtin ku amadekariyên xwe bi awayekî pratîkî xistine meriyetê."



Em vê êrîşê wekî berdewama êrîşên Kerkûk û Efrînê yên li ser bingeha dijminatiya kurdan pêk hatiye, dibînin. Di vê êrîşê de yek ji siyasetmedarê pêşeng û lawê nirxdar ê gelê Êzidî Mam Zekî jiyana xwe ji dest da. Ji ber vê wendabûnê êş û azara me gelekî mezine.

Divê hemû saziyên Kurdistanî di wê zanebûnê debin ku ev êrîş li kîjan perçeyên Kurdistanê dibe bila bibe, li hemberî destkeftî û daxwazên azadiyê yên gelê Kurd hatiye kirin."

Ozturk, herî dawî destnîşan kir ku ev êrîş li hemberî daxwazên biratî, aştî, edalet û azadiyê ya gelên Rojhilata Navîn ku li Rojava û Şengalê şînbûye pêk hatiye û wiha bi dawî kir: "Em bang li hemû gelên Rojhilata Navîn dikin ku li hemberî vê êrîşê bisekinin û bi gelê me yê Êzidî re di nava tevkariyê debin. Em vê êrîşê di şexsê gelê Êzidî yên ku gefa çeteyên DAIŞ'ê li ser hemû gelan avakiribû ji holê rakirin, ji bo mirovahiyê têkoşîneke bêhempa meşandine û berdêlên mezin dane, li hemberî hemû civakên navneteweyî pêk hatiye dinirxînin. Ji ber vê yekê em bang li civakên navneteweyî dikin ku li hemberî êrîşên ser gelê me yê Êzidî tên meşandin bi hestyarî tevbigerin,û xwedî li wan derkevin.



## Sempatiya Çepgiran(!) a ji Erdogan re

Burhan ERDEM

Di dema destpêka çepgiriya xwe de, ez bûm şahidê sempatiya hin "hevrê"yan a ji bo dîktatorekî. Di sala 1989'an de destwerdaneke Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) hebû ku xwe gihand sala di peyre jî. Mudaxeleyî Panamayê kiribû.

Li panamayê jî dîktatorekî wê hebû ku heta wê rojê li dijî şoreşgerên Amerîkaya Latîn (Sandînîstên Nîakragûayê di serê vana de dihatin) bikardianî: Manuel Noriega! Pêşiyê 2 caran darbeyên têkçûyî ku DYA'yê piştgirî dida wan pêk hatibûn, lê Noriega serkeftî derketibû. Ji ber vê jî Serok Bushê yekemîn feman dabû û bi operasyneke leşkerî Noriega girtibûn. Ji bo hin çepgiran Noriega, ji ber dijderketina xwe ya li hember DYA'yê, bûbû weke lehengekî.

Îroj jî di cîhana çepgiriyê de, ji ber aloziya bi DYA'yê re, sempatiyek ji Tirkiyeyê re û bi taybetî jî ji Serokomarê wê Recep Tayîp Erdogan re peyda bûye. Weke ku Erdogan li dijî empariyalîzmê be, li hin dewletên xwediya kevneşopiya çepgiriyê, propagandaya Erdogan tê kirin. Weke ku li Venezuellayê alîgirên Madûro, rewşa Erdogan dişibînin, destwerdana emperyalîstan a li dijî xwe.

Hinekî gefên ji Serokê DYA'yê Donald Trump tên vê nêrînê dide însên. Xeke mînak; vê hefteyê Serok Trump (dîsa bi tweetekê) got: "heta îro Tirkiye ji Amerîkayê feyde didît lê ji niha pê ve wê berdel bide." Berdêl jî ew ku heke Tirkiye kêşe Brunson bernede wê ambargoyên nû deynin ser Tirkiyeyê. Ev ambargo jî heta bidawîbûna îktidara Erdogan wê bidomin. Piştî wî jî, birînên di aboriya Tirkiyeyê de, ji ber vê ambargoyê peydabûne, wê bên kewandin. Eger krîz bi dawî bibe, -were bidawîkirin- ekonomîst dibêjin pêvajoyeke bi qasî 8-10 salan dixwaze ku heta Tirkiye, veguheze rewşa xwe ya beriya vê krîzê.

Di rastiya xwe de destwerdanek heye! Lê destwerdaneke li dijî dîktatorekî heye ku tu aleqeya wê bi bûyina antî-emperyalîzmê re nîne. Mirov dikare ji bo vê yekê mînakên Saddam, Mîlosevîç an jî Esad bi bîr bîne. Dema ev dîktator bûbûn hedefên DYA'yê, li cîhana çepgiriyêji bo wan sempatiyek peyda bûbû. Heta beriya çend salan serokkomarê Îranê yê hingê Mehmûd Ehmedînecad jî, li cem çepgirên amerîkaya latînî bûbû antî-emperiyalîst.

Di çepgiriya Tirkiyeyê de jî, hin derdorên dudilî nêzî dibin hene. Vana, bi bûyina antî-emperyalîst xwe îfade dikin. Di xwezaya xwe de jî antî-amerîkanî karê wan e. Wê were bîran, çawa vana li wan generalên ergenekonî xwedî derdiketin û wan antî-emperiyalîst nîşan didan. Vana şoreşa rojava jî, weke lîskeke emperiyalîzmê nîşan didan. Lewra. li dijî DAIŞ'ê DYA'yê alîkariya YPG'ê dikir.

Lê hê ji destpêka xwe ve, tespîta cîhana çepgiriyê ya li ser emperiyalîzmê vê karekterê wê vedigot. Kapîtlîzma kurewî, kî li hemberî wê bibe asteng wê ji holê rabike. Ew kesên ku bûne kelemên li pêşiya geşbûna wê -ku vana ew dîktatorên wê bi xwe ne- yek bi yek hatine îmhakirin. Gelekî jî eşkere ye ku heman tişt tê serê Erdogan jî.